# Hikimdariya ne ji xelkê, bo xelkê nine

»»» R:10



# Federalîzm mafê herî kêm bo netewan

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (440) 19-02-2023Buha (1000) Tûmen*

# Bila erdheja 6ê Şibatê ji me ra bibe mîladeke nû

»»» R:3

# Helbet Dê Zivistana Biqede.Bihara

»»» R:9

## Daxuyaniya Navenda Hevkarî bi hilkefta salroja Zimanê Dayîkê

**Xelkê azadîxwaz yên Îranê, hevwelatiyên hezkirî!**

**Çalakvanên mafê mirovî yên ziman û berevankarên zimanê dayîkê!**

Li germahiya şoreşa pêşkevtî û fire re-hendî ya "Jin, Jiyan, Azadî" de, salroja cîhanî ya zimanê Dayîkê bi bîr tînin. 2`ê Reşemehê(21`ê Şibatê) di salnameya cîhanî de rojeke ku ji aliyê "UNESCO" yê ve weke "Roja cîhanî ya zimanê dayîkê" hatiye diyarîkirin û hînkirina bi zimanê dayîkan û li kêlega fire kultûrî de xwandin bi wan zimanan girîng daniye.

Ziman hem di şêweya nivîsînê de dewreyeke sereke di paras-tina mîrata dîrokî û kultûran de dilîze û hem xwandin bi zi-manê dayîkê weke sebebek girîng bo hînbûn bi îlm û zanistê tê hesab kirin.

Di demekê de ku ci-vaka navdewletî tekezî li ser mafê bingehîn û mirovî yê perwerdeya bi zimanê dayîkê dike, lê li Îrana pir

ناوەندی هاوکاریی حیزبەکانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.

مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

zimanî, pir çandî û pir neteweyî de ev maf ji ber serwerî û dîktatoriyê hatiye înkarkirin û perwerdeya bi zimanê dayîkê hatiye qedexekirin.

Daxwaza vî mafê ku nayê înkarkirin wek metirsiyekê li ser serweriya welat çav jê kirine û daxwazkar û berevankarên vî mafî bi îşkence, zîndan û bêparbûna civakî re rû bi rû dibin.

Ev siyaseta înkarê bûye sedema pirsgirêkên mezin ji bo gel û neteweyên Îranê ji bo pêşvebirin û parastina nasnameya xwe ya çandî û netewî û bidestxistina derfetan ji bo beşdariya di geşepêdana zanist û çandê de û ban-doreke nerênî û seqet li ser civaka Îranê bi giştî hiştiye.

Di encama peyrewîkirina vê siyasetê ji aliyê rejîmên dictator ve, hin ziman ketine ber metirsiya jinavçûnê û piraniya wan rastî guherînkariyan bûne û zirar gihandine li serxwebûna çandî, ku ev yeka jî, sedemên ne pêşketin û geşedan li Îranê deye.

Eşkere ye ku azadiya xwandin bi zimanê dayîkê ne tenê nabe sedema cudahî danîn, kêşe û metirsiyan, belkî dê bibe sedema yekrêziya zêdetir di navbera neteweyên Îranê de.

Di şoreşa "Jîna"yê de berewajiyê zêdexwazî û bîr û hizra faşîstan, di nav xelkên cuda yên Îranê de, em şahidî rêzgirtin li zimanê yekitir û heta dubare kirina dirûşiman bi zimanên cuda li xwenîşandanên navx-we û derveyî Îranê bûn.

Em weke Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê, daxwaza bidestveanîna mafê xwandin bi zi-manê dayîkê bo hemû neteweyên Îranê ne û li Kurdistanê de jî be-revanî ji wî mafî dikin û bo bidestveanîna wî mafî weke parek ji mafê neteweyên xelkê Kurdistanê xebat dikin.

**Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê**

**30`ê Rêbendana 1401`ana Rojî**

**19`ê Şibata 2023`an**

# Federalîzm mafê herî kêm bo netewan



N: Nûredîn Sofîzade

Di dewletên pêşkevtî de ku hemî civaka welat bi yêk çavî tê mêzekirin û her kes bi hemî cudahiyên olî, çandî, zimanî, etnîkî, cinsiyetî, tixmî, qatî, reng û yên din xwediyê mafê wekhev in û yasaya bingehîna welat bi awayekê tê darêtin û nivîsîn ku her aliyek xwe û mafê xwe têda bibîne, ji bona çêkirina welatekî bihêz û yêk dest, mesela milet – dewlet û serweyî her tiştekê tê danîn.

Lê hekî bi berewajî be, desthilat û yasaya welatekê cudahiyên netewî, olî, çandî, qatî, etnîkî, cinsiyetî, bi yêk çavî nebînin û xwediyê mafê wekhev nebin, û di yasayê de, yan ji aliyê desthelatê ve, her mafek bo yêk ji cudahiyan bê danîn û cudahiyên din weke bin dest û derece 2 bên tîtin û desthilat bixwaze hemî cudahiyan di nav bijarda xwe de îca çi netewî be yan olî yan etnîkî yan tixmî û qatî û cinsî, bihelîne asmîle bike, hingê ev cudahiyên din ji bona man û mewcudiyeta xwe û bona evê ku bigehne mafê xwe xebatê dikin û berxwe didinê, wê demê ger desthilatê guh neda daxwazên wan û cehd kir ku ji rêka tepeserî û girtin û kuştinê ve dengê wan mat bike, hingê ye ku ev desthilat weke dîktator û xwe sepên tê pênase kirin.


Em dibînin ku dema li Ewropa û bi taybetî piştî şoreşa Feransê mesela çêkirina dewlet-netewe hate ber bas, bê berçavgirtina cudahiyên curbicur yên civatgehê, hemî bi yêk çavî û xwediyê mafê wekhev li çarçêva welatekê de hatine dîtin û yasa hinde pêşkevtiyane hatine darêtin ku hemî civak xwe û mafê xwe tê de didît, bê evê ku netewek, olek, zimanek, çandek, li pêxema mezin kirin û dana desthilatê bi yêk ji cudahiyên welat, aliyên din yên cuda asmîle nekin.

Lewma em dibînin ku di hinek dewlet û welatên modern de bi berçav girtina cudahiyan li çarçêva welat de û gorî yasaya bingehîna welat îtraf bi mafê hemî cudahiyan hatiye kirin û bo evê ku çi aliyek xwe bê maf û mexdûr nezane, her di nava qewara wî welatî de desthilata birêveberî û îdareya her cudahiyekê xwediyê wan hatiye spartin, îca çi li şiklê beşdar kirina wan li desthilata giştiya welat da, çi bi awayekî otonomî yan konfedral yan federal.

Lê, di welatên paşkevtî de û bi taybetî li vê navça me de anku Rojhilata Navîn, her tiştek bi berewajî tê dîtin, ji bona çêkirina dewlet-netewan, ji mekanîzma asmîlasyonê mifah vergirtine, li heçî welatekê de ku yêk ji ol, netewe, etnîk, nijad, û … hwd, geheştibe desthilatê, bi hemî hêza xwe cehd kiriye ku heçî cudahiyekê di nava xwe de bihelîne û ji bona yêk dest kirina welat, bi bê berçav girtina mafê cudahiyên xeyrî xwe wek netewe, ol û çand û zimanên din qedexe bike.

Desthilat û dewletên ku Kurdistan li ser wan de hatiye parvekirin, wek Îran, Turkiye, Sûriye û Îraq bona çêkirina dewlet, netewe di 100 salên derbas bûyî de, hinek hêlên sor bo xwe danîne weke, Yêk Xak, Yêk Milet, Yêk ziman, Yêk Ala, ev jî tenê ji bona helandin û qedexe kirin û nehêlana hemî cudahiyên di nava wan welatan de bûye, ziman, çand, mafê netewî, dîrok û … hwd, gelê Kurd ji aliyê wan dewletan ve hatiye qedexe kirin.

Ger em taybetî basê Îranê bikin, em dibînin ku di 100 salên vê dawiyê de, û piştî nemana desthilata Qacariyan û hatina ser kar a Riza Xanê Pehlevî, yan Mîrpenc, hekî çi xwast bizayê çêkirina dewletnetewe, lê kar û kiryarên wî bo gihîştina bi vê armancê hemî bi berewajiyê welatên Ewropayî bû.




Wî hemî cudahiyên di nava Îranê de qedexe kirin weke Netewe, ziman, çand, li yasaya bingehîn de zimanê fermî kire Farsî, Yêk miletî bi ser hemî xelkê Îranê de sepand û her kes û aliyekê jî nerazîbûn dabe xuya kirin , bi tepeserî û girtin û kuştinê bersiv da, ewa jî di demekê de ye ku Îran pêk hatiye ji netewên Kurd, Ereb, Belûç, Turkemen, Turkên Azerî, Fars û hinek etnîkên din yên weke Gîlek, Mazinî, Bextiyarî, Qeşqawî, Lor, û yên din.
Piştî şoreşa gelên Îranê û sernixûniya rejîma Paşayetî û hatina ser kar a rejîma Îslamî, ji bilî evê ku hemî hêlên sor yên rejîma Paşayetî yên weke Yêk Milet û Yêk ziman û Yêk xak parastin, vê carê li yasaya bingehîn de yêk ol jî cih kirin.

Desthilatên dictator, yêk du yêkê yên Navenda Îranê, bona bê maf kirin û nedîtina netewên din û qorix kirina hemî desthilatê li destê xwe de ku aliyên Maddî û ewlehî û serbazî bi xwe ve digire, berdewam basê wan hêlên sor dikin.

Îro rojê netewên cuda yên Îranê ku çi xaleke hevpar di gel netewa bala dest anku Fars da çinînin, mafê xwene ku ji bona çêkirina dewlet û netewa xwe hemî ji hev veqetin, û di rastî de Îran aliyê kêm bibe 6 welat.
Lê, niha û bi berçav girtina rewşa hemî aliyan, Federalîzm bijarda herî munasib e, hekî ev kesên dilê wan bo yêk parçeyî ya Îranê lê dide, Federalîzmek ku demokratîk be, hemî netewên Îranê her bxwe Îdara wê cografiyayê bikin ku tê da dijîn, zimanê wan li navça wan de fermî be, çand û dîroka wan bê parastin, yanî herbxwe çarenivîsa xwe bigirin dest xwe.
Niha ku şoreşa seranserî ya xelkê Îranê bi dijî rejîma dîktatora Îslamî destpê kiriye, hewce ye bo çêkirina Îraneke cuda ji Îrana dîktator lêdayî, aliyên opozîsyon li ser altirnatîva piştî Komara Îslamî, li ser Federalîzma Cografiyayî û netewî yêk deng bin, aliyên Fars jî dibe dev ji vê nijadperestiya sed saleye xwe berdin û hekî hez nakin Îrana wan jihev belav nebe, hemî hêlên xwe yên sor danên qirax û bên ser ra û dengê piraniya xelkê Îranê ku netewên xeyrî Fars in.

Gorî Carnama Saziya Netewên Yekbûyî li ser mafê netewan, hatiye ku li heçî civatgehekê de ku ev xalên hevpar hebin weke Zimanê hevpar, Xaka hevpar, Çanda hevpar û Dîroka hevpar, eve dikare xwe weke netewyeke serbixwe pênase bike û li ser wê xakê ku dijî, dikare dewleta serbixwe ya xwe hebe, her gorî wî mafî em wekî netewa Kurd ku xwediyê wan taybetmendiyan in, divê me ev mafa hebe ku mafê çarenivîsiya xwe bigirne dest xwe ku Serbixweyî, Konfederalîzm û Federalîzm û Otonomiye, Îro ku Kurd bi kêmtirîn mafê xwe ku Federalîzme raziye, divê desthilatên wan welatên ku Kurd têda ne, memnûn bibin.

# Bila erdheja 6ê Şibatê ji me ra bibe mîladeke nû



N: Mustafa Ozçelîk

Herdu erdhejên mezin ên ku roja 6ê Şibatê rûdan, felaketên mezin ên canî, însanî, civakî, derûnî, aborî jî bi xwe ra anîn.

Çawa ku pandemîya Covîd-19ê ji temama mirovahîyê ra bû mîladeke nû; bi ya min ev erdheja jî bi gelek alîyên xwe ve, divê ji me ra bibe mîladeke nû. Wek mirovekî , wek kurdekî, bi taybetî jî wek kedkarekî doza azadîya Kurdistanê ; divê em fikir, kiryar, helwest, sîyaset, berjewendî û peywendîyên xwe yên di hemû beşên jîyanê, ava kirina bajaran û pêwîstîyên tevgera neteweyî da ji nû ve, bi çavekî din binirxînin; di moxileke zanistî, însanî, wîcdanî, adilane, neteweyî, niştimanî ra derbas bikin.

Û bêyî ku xwe bixapînin, divê em rastîya xwe bibînin.

Divê em bi hişmendîyeke nû ji vî wêneyê me yê di vê erdhejê da derket holê dersên pêwîst derxînin û rûpelekî nû vekin.
Belê li gori agahdariyên ku Dewleta Tirkîyeyê ragihandine, heta nuha yên ku jîyana xwe ji dest dane, ji 40 hezarî, yên birîndar jî ji 100 hezarî zêdetir in. Lê di rastîyê da yên ku dê jîyana xwe ji dest bidin dê ji 100 hezarî, yên birîndar jî dê ji 150 hezarî zêdetir bin.

Zerara herî mezin gîhaye bajar û navçeyên Hetay , Semsûr(Adiyaman), Mereş , Meletîye, Dîlokê(Entab) .

Lê li Amed, Ruha, Kilîs, Edene, Osmanîyeyê jî zerareke mezin heye, li van hemû bajaran, bi giştî, bi hezaran mirî, bi deh hezaran birîndar hene. Ji xwe zerara madî , ji texmînên ku têne kirin, gelekî zêdetir û mezintir e.

Li Efrîn , Cinderes û Helebê jî erhej bûye sebebê felaketeke mezin . Û mixabin alîkarîyeke berbiçav negihîştîye van deran. Heta nuha yên ku jîyana xwe jidestdane ji 6 hezarî, yên birîndar jî ji 10 hezarî zêdetir in. Bi hezaran avayî xerabûne, zerareke mezin a madî çêbûye.Gel di rewşeke perîşan da ye.

Ji 6ê Şibatê ve heta îro, helbet ku em nabêjin Dewleta Tirkîyeyê tu tişt nekirîye, lê pir aşkere ye ku , bi qasî ku pêwîst bû û di wexta xwe da, wazîfeyên xwe neanîye cîh.

Di 3 rojên ewil da, di hawarhatinê û di alîkarîya mexdûran da dewlet lawaz bû, bê koordînasyon bû. Ev jî bûye sebep ku mirî, birîndar û zerarên erdhejê gelekî zêdetir bin.Ya herî xerab jî ewe ku , Dewleta Tirkîyeyê hîna jî şaşitî, xeletî, kêmayî , îhmal û bêserûberîya xwe qebûl nake.

Karesateke din jî ew e ku, Dewleta Tirkîyeyê bi taybetî di 3 rojên ewil da, rê neda ku ji derveyî wê gelek kes û dezgeh û alî yekser bi dest û îmkanên xwe alîkarîyan bigihînin mexdûrên erdhejê. Nuha jî li gelek deran ev astengî berdewam in. Ev helwesta Dewleta Tirkîyeyê jî bûye sebep ku mirî, birîndar û zerar û mexdûrîyetên erdhejê gelekî zêdetir bin. Aşkere ye ku berf û baran û sermaya heyî ya dijwar jî, hejmara kesên jîyana xwe ji dest dane û yên birîndar zêdetir kirine, mexdûrîyeta erdhejê gelekî berfirehtir û kûrtir kirîye.

Li gel hemû astengîyên yasayî û fiîlî yên ku Dewleta Tirkîyeyê heta nuha derxistîye û derdixe jî, gelê me bi hestyarîyeke mezin alîkarîya mexdûran dike; li Bakurê Kurdistanê, Tirkîyeyê û li dîyasporayê, gelek partîyên sîyasî, dezgehên sivîl, kesayet, beledîye û şîrket ji bo alîkarîya birîndar û mexdûran, xebat û kampanyayên baş pêk anîne, pêk tînin. Cîhê dilxweşîyê û serbilindîyêye ku, Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Weqfa Xêrxwazîya Barzanî û gelê me yê Başûrê Kurdistanê xebateke berfireh ji bo alîkarîya mexdûrên erdhejê dimeşînin. Weqfa Xêrxwazîya Barzanî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê, helbet ku van xebatên alîkarîyê wek wazîfeyeke însanî, neteweyî û welatperwerane dibînin.

Serokê Herêma Kurdistanê Rêzdar Nêçirvan Barzanî li Dîlokê(Entab) seredana cîhên ku erdhej lê çêbûye kir. Ev jî, helwest, hişmendî û piştgirîyeke însanî, milî, hêja û watedar e.

Li Rojhilatê Kurdistanê gelê me li himberî Rejîma Îslamî ya Îranê di nav xebat û têkoşîneke berfireh da ye. Partîyên Kurdistanî yên Rojhilatê Kurdistanê jî, ji ber vê felaketa erdhejê xemgînîyên xwe dîyar kirin û piştgirîya xwe bi gelê me yê Bakur û Rojavayê Kurdistanê ra ragihandin.

Divê ji ber vê helwesta wan a însanî, neteweyî û welatperwerane, em spasîya xuşk û birayên xwe yên li perçeyên din ên Kurdistanê bikin.

PAK, TDK-TEVGER, PSK, HAK-PAR, PDK-BAKUR, KKP, HDP, DIAKURD, REWENDA KURDISTANÎ, KURD-KAV, WEQFA RÊYA AZADÎ, DEZGEHÊN SIVÎL, YÊN KARSAZAN, YÊN MESLEKÎ, SENDÎKA Û BAROYÊN LI BAKURÊ KURDISTANÊ, FEDERASYONA DGD, KOMELEYÊN KURDÊN ANATOLÎYA NAVÎN, KOMELEYÊN ELEWÎYAN û bi sedan dezgeh, beledîye û bi hezaran kesayetan xebat û kampanyayên alîkarîyê meşandin, dimeşînin.

Ji bo mexdûrên erdhejê kî çi alîkarîyê bikin, pîroz e, xêr e, biqîmet e, hêja ye. Helbet ku ev ji bo hinekan wek wazîfeyeke însanî, neteweyî, niştimanî ye, ji bo hinekan jî berpirsyarîyeke însanî, wîjdanî ye. Lê, dive em spasîya wan hemûyan bikin.

Gelek dewletên cîhanê jî alîkarîyên cûr be cûr digihînin deverên ku erdhej lê çêbûne.

Lli kîjan welatî, kîjan bajarî dibe bila bibe, kî ji bo mexdûrên erdhejê çi alîkarîyê bike, divê em li milet û dîn û mezhebê wî/wê nenêrin, divê em rêzê lê bigirin, karê wan hêsantir bikin, ji wan ra bibin alîkar, spasîya wan bikin.
Em her kesek, her dezgehek, her partîyek jî, li Bakur û Rojavayê Kurdistanê, li Tirkîyeyê û Sûrîyeyê ji bo alîkarîya mexdûrên erdhejê çi ji destên me bê divê em pêk bînin.

Divê em xebat û kampanyayên berfireh yên ji bo alîkarîyê organîze bikin.
Herweha heyeteke hevbeş a PAK, PSK, TDK-TEVGERê li bajar û navçeyên ku erdhej lê çêbibûn, çar rojan lêkolîn, çavdêrî, seredan û hevdîtin pêk anîn û di derbarê van seredanan da çavdêrî û pêşniyarîyên xwe wek raporekê pêşkêşî raya giştî kirin.Ev rapora jî belgenmeyeke bi qîmet e.
Divê avahî li gorî rastîya erdhejê, prensîbên endazyarîya jeolojî û bînasazîyê bêne ava kirin

Erdhej rûdaneke xwezayî ye, meriv nikare rê li ber bigire.

Lê em dikarin bêjin ku sebebên zerarên erdhejê ne xwezayî ne; berhemên bêwîjdanî, berjewendîperestî, bêûsûlî, gendelî, xeletî , şaşitî û bêprensîbîyên dezgehên fermî , şîrket û mirovan e.

Piranîya erdê Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê wek jeolojîk herêmên ku xeterîya erdhejê lê gelekî zêde ne. Ji ber vê rastîyê jî li Kurdistane, li Tirkîyeyê û li cîhên ku

»»»Dom R:4

»»»Doma R:3

xeterîya erdhejê lê zêdetirin, ji bo ku di erdhejê da zerara canî nebe, yan jî zerar pir kêm bin; divê bajar û avahî li nêzîkî xetên fayê û li ser erdên ku ax û bingehên wê siśtin neyên ava kirin; divê li deverên nêzîkî xeta fayê û li ser erdên ku axa wê siśte jî, li deverên xeterîya erdhejê kêmtir jî, projeyên(dîzayn) avahîyan li gorî raśtîya erdhejê û li gorî prensîb û hewcedarîyên endazyarîya jeolojî û bînasazîyê bêne amade kirin; divê sîśtemeke kontrolê ya baş hebe û divê ev sîśtema kontrolê ji gendelîyê dûr be, însanî be, adilane be, zaniśtî be; divê malzemeyên esasî yên wek beton (konkrît) û şîşê(hesin), li gorî prensîbên endazyarîyê û li gorî tesbîtên projeyê bêne çêkirin û bikaranîn; divê hemû karên ava kirinê bi hośtatî û deśtkarîyeke baş ya li gorî projeyê bêne bicîh anîn.

Heger em li gorî van rê û rêbazana tevbigerin, tu şik tê da tuneye ku, dê zerara canî ya erdhejê hema hema tunebe, yan jî dê pir kêm be, belkî birîndarîyên ne xeter hebin û dê zerara madî jî pir kêmtir be.Û ev karên ku em behs dikin jî ew kar in ku em dikarin bi hêsanî bicîh bînin.

Belê, mesele pir zelal e: Wekî gelek pispor jî dibêjin, erdhej mirovî nakuje; avahîyên ku li gorî raśtîya erdhejê û li gorî prensîb û hewcedarîyên endazyarîyê û bi hişmendîyeke însanî nehatine ava kirin mirovî dikujin. Bi vê maneyê, felaketên ku piştî erdhejê têne serê me, di eslê xwe da qetlîameke ku bi deśtên berjewendîpereśt û gendelan rûdide.

Li gorî zanîn û aśta endazyarîyê ya ku mirovahî gihîştîye û li gorî îmkan û zanîn û aśta ku teknolojî gihîştîyê, mirov dikare avahîyên weha ava bike, ku xwe li ber erdhejên bi şîdeta 9ê û jê zêdetir jî bigirin. Heger di erdhejekê da zerarên canî û malî çêbûbin, berpirsyarê yekem yê herî mezin, bi dezgeh û wezartên xwe yên peywendîdar, bi beledîyeyên xwe ve dewleta wî welatî ye.

Berpirsyarê duyem, wan dezgehên endazyarî yên fermî û sivîl yên kontrolêr in û şîrketên şêwirmendîyê yên ku li ser navê dewletê kontrol û şêwirmendîyê dikin e.

Berpirsyarê sêyem ew mirov, miteahîd, şîrket û endazyar in ku, ji ber berjewendîyên xwe yên şexsî, grûbî yên madî, wan prensîb, pîvan, nirx, wîjdan, kevneşopî, ehlaq û hiqûqa gelemperî ya endazyarîyê û ya mirovahîyê têkbirine, binpê kirine.

Berpirsyarê çarem, li gel van hemû tecrubeyên xerab yên erdhejan jî, ew gelê me yê ku ji van felaketan dersê dernaxîne û dîsa jî bêyî belge û raporên zaniśtî û endazyarî, diçin xanî û avahîyan dikirin e.

Belê, erdheja 6ê Şibatê dê bibe sebebê êş û birînên gelekî mezin. Lê ji bo alandina birînên xwe, divê em li benda însafa bêînsafan nemînin.

Ez bangî Hikûmeta Herêma Kurdiśtanê, hemû dezgeh, partî û kesayetên Kurd û Kurdiśtanî yên li her çar alîyên cîhanê dikim da ku, em di xebata gîhandina alîkarîyên ji bo mexdûrên erdhejê da berdewam bin, em wan bitenê nehêlin; roj roja hevgirtinê ye, roja lihev xwedî derketinê ye!

Helbet ku barê felaketên bi vî rengî, dikare bi îmkanên dewletan û bi alîkarîyên navdewletî bêne hilgirtin. Ji ber vê raśtîyê jî, em em bangî rayedarên Dewleta Tirkîyeyê dikin da ku rê li ber alîkarîyên dezgehên sivîl û yên dewletan negirin û berîya her tiştî berpirsyarîyên xwe yên dewletî bicîh bînin. Heta ku çareserîyên mayînde bêne bicîh anîn, di demeke herî kurt da divê pêwîśtîyên mexdûran yên acîl, yên wek alîkarîyên aborî, çadir, konteyner û cîhên ku lê bimînin, cil û bergên ziviśtanê, sobeyên cûr bi cûr, êzing, komir, erzaq, av, derman, pêwîśtîyên zarok û jinan, nivîn û betanîyeyan temîn bikin. Em bangî Netewên Yekbûyî, Konseya Ewrûpayê dikin, da ku alîkarîyên pêwîśt û berfireh bikin û zextên cidî li ser Dewleta Tirkîyeyê deynin da ku di vê derbarê da xemsarîyên zêdetir neke.

**18.02.2023**

**Muśtafa Ozçelîk**

**Serokê Giştî yê PAKê**

# Xebata Parlamentoya Tirkiyê careke din hat paşxiśtin



Piştî erdhejên mezin ên 6ê Sibatê yên navend Mereş ku karesateke mezin a mirovî bi xwe re anî, xebata Parlamentoya Tirkiyê heta 13ê Sibatê hatibû paşxiśtin.

Serokwekîlê Koma AK Partiyê yê parlamentoyê Muśtafa Elitaş, îro Yekşemê ragihand ku navbera xebatê ya ku ji bo parlamentoyê hatibû dayîn, hatiye dirêjkirin.

Elitaş diyar kir ku ji ber piraniya parlamenter li herêma erdhejê ne, bi lihevkirina partiyên siyasî biryar hatiye dayîn ku xebata parlamentoyê heta 28ê Sibatê were paşxiśtin.

Piştî erdhejên ku li 10 bajaran bi deh hezaran welatiyan can daye, cara duyem xebata parlamentoya Tirkiyê tê paşxiśtin ku herî dawî biryara 21ê Sibatê hatibû dayîn.

TBMM
erdhej
Deprem

# Macron Bang li Hevbendan Dike ku Piştgirîya ji Ukrayna re Xurt Bikin



Serokê Fransa Emmanuel Macron li Konferansa Ewlekarî ya Munîhê de bang li hevbendan kir ku piştgirîya leşkerî ya bo Ukrayna xurt bikin.

Macron got ku divê Fransa deśt bi êrîşa dijber bike û dîyar kir ku niha bi Moskowê re ne dema dîyalogê ye.

‘’Divê em bi pêgirî piştgirîya xwe ya bo gel û artêşa Ukrayna xurt bikin ku ew deśt bi êrîşeke dijber bikin. Bi wî awayî ew dikarin rê li ber danûśtandinên pêbawer vekin. “

Serokê Fransî got ku hevbendên Rojavayê yên Kîevê bo şerekî dirêj yê li Ukrayna jî amade ne.

Macron got ku jiber ku Moskow şer bijartiye û pevçûnan gurtir dike û êrîşan dibe ser binesazîyên sîvîl ne dema dîyalogê ye.

# Îhsan Aydîn: “Mixabin, dewleta Tirkîyê ku gelek caran tûşî karesatên bi vî rengî bibû. Dîsa jî tu amadekarîyê ku bikare mudaxeleyên afatekî bi vî rengî bike tunebû.”



**Îhsan Aydin**
**Endamê Meclîsa PAK**

**Me li derheq rewş û çawaniya erdheja Bakûr û Rojavayê Kurdistanê digel rêzdar Îhsan Aydîn, Endamê Rêveberiya PAKê hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: “Mixabin, dewleta Tirkîyê ku gelek caran tûşî karesatên bi vî rengî bibû. Dîsa jî tu amadekarîyên ku bikare mudaxeleyên afatekî bi vî rengî bike tunebû.”**

**P: Rêzdar Îhan Aydîn bi giştî xisarên erdhejê li Bakûrê Kurdistanê çi qas e û kîj bajar girtine?**

**B:** Ev erdhej roja Duşemê 6ê Sibata 2023yan di berbanga sibê de di demjmêr 04.17ê de bi erdhejeke mezin a bi hêza bi 7.7 pileya rîxterê ku navenda wê navçeya Pazarcix a Mereşê li Bakûrê Kurdistanê bû, Bakûr û Rojavayê Kurdistanê û çend parêzgehên Tirkiyê jî da berxwe.

Di heman rojê da nîvro di demjmêr 11.00an de erdhejeka din a bi hêza 7.6 pileyê rîxterê navçeya Elbistan a Mereşê dubare hejand. Erdhejê bandor li Mereş, Semsûr, Kilîs, Amed, Dîlok, Riha, Meletî, Efrîn, Cindirês, Heleb, Hatay, Osmanîye û Edeneyê jî kir, û bûye sedema wêraniyeke mezin û mirina 46 Hezar kesan û birîndarbûna bi 150 hezaran kesên din. Li gor pisporên vî karî, tê pêşbînîkirin ku jimara mirîyan bigihîje 100 hezarî û ya birîndaran jî bigihîje 300 Hezarî.

Di vê erdhejê de, bi dehan gund û navçe hema bêje bi giştî kavil bûne. Bi hezaran xanîyên bi gelek tebeqeyan hatine xwarê û herwiha bi sed hezaran xanî jî dereceya ku lê man qedexe ye xisar dîtine.

**P: Rêzdar Îhan pêragihîştinên dewleta Tirkiyê û pêka alîkariyên cîhanî bo mexdûran çawa ye?**

**B:** Mixabin di warê afatekî bi vî rengî de em dikarin bêjin tu amadekarîyekî birêkûpêk a dewleta Tirkîyê tunebuye. Herdû rojên pêşî xelk bi xwe lê dixebitî ku kesûkarên xwe ji bin kavilan derxin. Birînên xwe bixwe bipêçin.

Mixabin, dewleta Tirkîyê ku gelek caran tûşî karesatên bi vî rengî bibû. Dîsa jî tu amadekarîyên ku bikare mudaxeleyên afatekî bi vî rengî bike tunebû.

Piştê du rojan ku alîkarî ji welatên din hatin, karîn mirîyan jî sax, mirovan di bin kavilan de derxin.

45-50 dewletên cîhanî hem fîzîkî û hem jî aborî alîkarîya xwe gîhandine dewleta Tirkîyê û mexdûrên erdhejê.

Ev felaket ewqas mezine ku, li gel alîkarîya ewqasa dewletên navnetewî jî, hêj jî bi deh hezaran mexdûr bê nan û av, bê şûn û war, bê derman û çadir û pêwîstîyên mirovî li kolanan dijîn. Piranîya mirîyan bê kefen û di gorên bikomel de têne definkirinê.

**P: Gelo ev gotina ku dibêjin dewleta Tirkiyê hawar xelkê Kurd yên erdhej lêdayî de naçe an jî kêm hawara Kurdan diçe ev gotinên han çiqas rast in?**

**B:** Dewleta Tirkîyeyê, bi taybetî di 2 rojên ewil da, ne bes li bajarên Kurdistanê, herweha li Hetay a ku bajarê Tirkîyeyê jî di nav da, Dewleta Tirkîyeyê hema hema li tu cîhên erdhejê da tunebû. Ji bo felaketên bi vî rengî Dewleta Tirkîyeyê ne xwedîyê tu amadekarîyên cidî bû. Piştî erdhejê jî, Dewleta Tirkîyeyê rê neda ku ji derveyî dezgehên girêdayî wan in, tu dezgeh û kes alîkarîyan bigihînin mexdûrên erdhejê. Ev herdu xeletî û helwest bû sebeb ku hejmara mirî û birîndaran û zerar û mexdûrîyet zêdetir bibin.

Piştî vê helwesta Dewleta Tirkîyeyê, di raya giştî ya Kurdan da fikare û fikrek xurt belav bûye ku, Dewleta Tirkîyeyê vê erdhejê ji bo guhartina demografîya Bakurê Kurdistanê ji xwe ra bike wek firsendekê. Ji ber ku tarîxa Dewleta Tirkîyeyê di vê derbarê de bi gelek nimûneyên guhertina demografîya Kurdistanê ve dagirtî ye , helbete ev jî ne tiştekî weha ye ku, meriv bibêje nabe.

**P: Rêzdar Îhsan Aydîn hin vîdyo belav bûne dibêjin ku ev erdheja dest çêkriye an heman piroja Harpe ye, hûn bizanin dewleta Tirkiyê bizanebûn ev kiryara encam dabe, û eger encam dabe dibe ji ber hilbijartina be an girêbesta Sicepico be?**

**B:** Ez bixwe nizanim ka gelo bi teknîka pêşketî ya îro meriv dikare erdhejekî wiha organîze bike? Lê, ez pê nebawerim ku teknîk gihîştîye wî astî.

Li vir meriv dikare bêje ku dewleta Tirkîyê guh li gotinên gelek pisporên vî karî girtîye. Ku bi dehan pispor ji bo rêvebirên dewleta Tirkîyê gotine ku, xeterî, metirsîyekî mezin heye ku dikare her dem bûyerekî bi vî rengî li vî xeta ku erdhejîya ye û deverên din jî erdhej pêk werin. Lê, rêvebirên dewleta Tirkîyê wek pêwîst guh nedana van gotinên pisporan. Xwe kerr kirine û li gor pêwîstîyê tevnegerîyan e. Amadekarîyan nekirine.

Li gel vê rastîyê tiştekî esasî jî heye ku, di eslê xwe da erdhej mirovî nakuje; avahîyên ku ne li gorî prensîbên endazyarîya jeolojîyê û bînasazîyê û ne li gorî rastîya erdhejê hatine ava kirin mirovî dikuje.

**P: Rêzdar Îshan ev alîkarî gihandina Herêma Kurdistanê bo xelkê Başûr çi bandorek li ser pêwendiyên dinavbera Kurdan û Tirkiyê de heye?**

**B:** Helbet em dikarin bêjin li nav welat û li diyasporaya Kurdistanî bi hestên birayetîyê û hemwelatîyê çi Partîyên sîyasî, çi dezgeh û sazîyên medenî û çi kesên welatperwer û mirovhez her yek ji alîyê xwe ve li gor qeweta xwe xîret kirin û li kes û karên xwe yên mexdûr xwedî derketin. Eva cîyê teqdîrê, cîyê serbilindî û cîyê kêfxweşîyê ye.

Lê, dema ku meriv bi hişmendîyekî netewî bifikire, dibê pêşî meriv bi serbilindî texdîr bike ku îdareya Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Weqfa Xêrxwazî ya Barzanî bi erkekî xwe yê mezin û hem di astê cîhanî û herwiha di hestên biratîyê de ya herî pêşî ku xwe gîhande birayên xwe yên mexdûr, Îdareya Herêma Kurdistanê û Weqfa Xêrzwazî ya Barzanî bû. Dibê her kurdekî bi vêya fexir be û şahnaz be.

Helbet ev helwest û kiryar di navbeyna her çar perçeyên Kurdistanê de, di hişmendîya neteweyî de, di hestê biratîya neteweyekî de, û ya herî girîng di xwedîyê desthilatbûnê de bandoreke erênî pêkhanîye. Hestê biratîyê, hişmendîya yek neteweyîtîyê, û ya herî girîng fikir, hişmendî û daxwaza azadîyê germtir û bihêztir kir.

**Îhsan Aydin**

**Endamê Meclîsa Partîya Azadîya Kurdistanê- PAK**

**Û Endamê Rêveberîya PAK Ewropa**

## Elham Elî Of: Hin beşên nizama Îranê di êrîşa ser balyozxaneya Komara Azerbaycanê dest hebûne



Serkomarê Azerbaycanê ragihandiye di êrîşa bo ser balyozxaneya Komara Azerbaycanê li Tehranê hin beşên nizama rejîmê di vê êrîşê de dest hebûne.

"Elham Elî Of" Serkomarê "Azerbaycan"ê roja Şemî 29ê Rêbendanê bo cara yekê bi awayekî rasterast karbidestên rejîma Îranê rexne kir û got ku, polîsên Îranê ew cura ku hewce bû pêşiya kesên êrîşker negirtin û piştî binçavkirina wî kesî ku êrîşî ser balyozxaneya me kiribû digel wî hevpeyvîn kirin û di medyayên xwe de belav kirin ku eva nîşana vê yekê ye ku ew kes ji aliyê hin ji beşên nizama Îranê bo wî karî hatiye şandin.

Herwisa ragihandiye Komara Îslamiya Îranê dibêje ku meşa dadweriya dosyeya wî kesî destpêkiriye, lê xwe ji lezgînî pêşveçûna karê dosiyeyê diparêze.

Navbirî di beşek ji gotinên xwe de basa vê yekê dike ku belgeyên zêde ji ber dest de hene ku nîşana vê yeke ye ku ew êrîş, êrîşek terorîstî ye, lê karbidestên rejîma Îranê ragihandine ku ew êrîş pirsgirekek kesî bûye ne êrîşek terorîstî.

Li roja 7ê Rêbendanê êrîşek çekdarî bo ser balyozxaneya Komara Azerbaycanê li bajarê "Tehran"ê hat kirin, û Serokê sirvîsa ewlehiya balyozxaneyê hat kuştin û du kesên din ji karmendên balyozxaneyê jî birîndar bûn û piştî wê êrîşê balyozxaneya Komara Azerbaycanê li Tehranê hat daxistin.

## Zirarberkevtiyên erdheja bajarê Xoyê di rewşeke xirab de ne



Piştî derbasbûna zêdetir ji 20 rojan ji erheja 5.9 rîxterî ya bajarê Xoyê, hê jî xelkê vî bajarî di bin sir û seqemê de dijîn û hewcehiya wan bi hevkariyê heye.

Piştî hatina erdehê li bajarê Xoyê heta niha, rejîma Îranê hevkariyek wisa nedaye xelkê zirardîtî yên erdhejê.

Xelkê zirardîtiyên erdheja bajarê Xoyê dibêjin, rejîma Îranê hin xîvetên ku bi xelkê re dabûn, cardin ew xîvet ji wan standin.

Çavkaniyek agehdar li bajarê Xoyê gotiye, "xelkê zirardîtiyên erdhejê bixwe neçar bûne ku hin xîvetên nestandar ava bikin".

Xelkê vir dibêjin tenê hevkariyên xelkî gihane destê me û ji rejîmê ti tiştek negihaye destê me.

Bajarên Rojhilatê Kurdistanê di hewleke mirovdostane de gihane hawara xelkê zirardîtiyên bajarê Xoyê û bi awayekî berçav kelûpelên hewce ji bo wan dabîn kirin, lê hê jî gelek xelkê bajarê Xoyê ji hevkariyên mirovdostane bêpar in û daxwaza hevkariyê ji xelkê xêrxwaz û mirovperweren Kurdistanê kirine.

## Cardin serhildêr hatine nav şeqaman û li dijî rûxandina rejîmê dirûşm dan

Duh şev 27ê Rêbendana 1401an a Rojî, piştî vê ku azadîxwazan banghêjî ji bo serhildana seranserî bo roja 27ê Rêbendanê belav kirin, li piraniya bajarên Rojhilatê Kurdistanê xelkê azadîxwaz û serhildêr li dijî rejîma Îslamî ya Îranê rijiyane nav şeqaman û dirûşm dan.

Ciwanên biwêr û azadîxwaz ên bajarê Sinê, bi hilkirina agir li ser şeqaman li dijî tevahiya rejîma Îranê û rêberê rejîmê dirûşm dan. Ciwanên qehriman ên bajarê Sinê dirûşma "Qasimlo Qasimlo rêya te berdewam e" dan. Dirûşmên azadîxwazên bajarê Sinê, "mirin bo Xamineyî, mirin bo dîktator û besîcî" bûn.

Li Kirmaşanê jî xelkê azadîxwaz hatine ser şeqaman û bi hilkirina agir rêyên sereke girtin û dirûşm dan.

"Mihabad bi tenê nîne, Ciwanro piştevan e", eva dirûşma xelkê azadîxwaz ên Ciwanroyê bû ku duh şev li ser şeqaman bûn. Li bajarê Ciwanroyê hin şeqam û tax di destê azadîxwazan de bûn û wan li dijî rejîmê dirûş dan.

Li Qurweyê xelkê azadîxwaz û serhildêr û bêzarbûyî ji rejîma Îranê hatine ser şeqaman û li dijî rejîmê serhildan kirin û di navbera hêzên rejîmê û xelkê azadîxwaz de şer û pevçûn rû da. Her li Qurweyê xelkê azadîxwaz bi ser hêzên rejîmê de zal bûn û şeqan girtine destê xwe.

Xelkê şoreşgêr ên bajarê Mihabadê rijiyane ser şeqaman û dirûşmên wek "heta Kurdek bimîne, Kurdistan jî dê bimîne", jin, jiyan, azadî, mirin bo dîktator û mirin bo Xamineyî" dan.




Li gor amara ajansên mafê mirovî, ji destpêka serhildana seranserî ve heta niha di nav serhildana sernserî de 122 serhildêrên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hatine şehîdkirin.

## Nerîna Lîderan



**“Nêçîrvan Barzanî:”**

Ev welat û ev milet dê her bimînin



**“Îlham Alî F”:**

Êrîşa ser balyozxaneya vî welatî li Têhranê ji aliyê Komara Îslamî ve hatiye kordînekirin.



**“Benjamin Netanyahu:”**

Îran berpirsê êrîşa li ser keştiya îsraîlî ye




**“Ehmed Xatemî”:**

Rêkxistina welat bi Welayet Feqîh re ye.

# Rola Kurdpa di şoreşa Jîna de



**N: Eskender Ceiferî**




Saziya mafên mirovan a Kurdpa ku niha di 12 saliya xwe de ye, hevdem ligel şoreşa Jîna, roleke wê ya bi bandor li ser eşkerekirina wan binpêkariyan heye ku di dema serhildanê de ji aliyê rêjîma faşîstên Tehranê ve têne kirin.

Ev sazî, bi belavkirina rojane ya nûçeyên girtina welatiyan bi tomegên siyasî û belavkirina belgeyan û herwisa çêkirina pêwendiyan di asta navdewletî de dive mînakek ji saziyên xwebexş di asta Kurdistanê de.

Wek baktiriyan, saziyan ku xwe wek parêzvanên mafên mirovan binav dikin, berfireh bûne. Di vê navberê de piraniya wan, tenê ji bo pere hatibûn avakirin, ji xwe piştevaniya aliyên navdewletî ji bo çalakvanên mafên mirovan jî bûye sedem ku fikra bazirganiyê berfireh bibe. Bi awayekî ku kesek dirabe û malperekê ava dike, navê wê didanî sazî û ji bo karên xwe, piştevaniya malî jî bi dest dixîne. Lê belê pêwîst bû saziyên wek Kurdpa, ajar vedin û bibin dengê binpêkariyên mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat.

Di şoreşa Jîna de rola Kurdpa êdî xuyatir bûye. Ji ber ku gelek saziyên navdewletî jî wê weke çavkanî bi kar tînin. Saziya Kurdpa ku ev 12 sal in çalak e û 3 salan berî niha li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hate tomarkirin, di daxuyaniya xwe ya avakirinê de ragihand: “Rewşa nebaş a mafên mirovan li navçeyên cuda yên Îranê û kiryarên desthilatdariyê ji bo binpêkariya zêdetir, berfireh û berdewam a mafên mirovan, bûye sedemeke girîng ji bo avakirina saziyeke mafên mirovan a serbixwe. Ew sazî wê hem nûçe û zanyariyên derbarê wan binpêkariyan tomar bike û hem jî binpêkariyan bişopîne. Saziyeke bi vî rengî, dikare li wan navçeyan ku saziyên din li wêderê çalak nîn in, perwerdeya mafên mirovan danî. Li ser vê bingehê jî Kurdpa wek saziyek ku ne li ser pêgeha berjewendiyê hatiye avakirin, pişta xwe bi hin rojnamevan û nûçegihanên pêşketî germ dike ku ji berê ve li hin ji wan navçeyan kar dikin lê belê ew kes hatibûn piştguxistin. Saziya Kurdpa ji aliyê toreke çalakvanan ve ku ji heman navçeyan in, hatiye avakirin.”

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, sala 2020’an li ser van 3 bingehan, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye tomarkirin û çalakiyên xwe berdewam dike. Lê berî wê jî, ji yazde salan berî niha ve her çalak bû.

Kurdpa ku ji aliyê şehîd Kawe Cewanmerd ve hatibû avakirin û heya niha jî di çeper û rêbaza wî de ye, ni awayekî xwebexşane ji aliyê kesên dilsoz ve ji bo doza Kurd û mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat bi awayekî bê beramber tê rêvebirin. Vê saziyê di beşeke din ji daxuyaniya xwe de tekez kiriye ku Kurdpa dixwaze kêmasiyan di warê nasandin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan de qerebû bike û vê valahiyê tijî bike. Li ser vê rêbazê jî 3 xalên sereke hene ku Kurdpa xwe bi wan wefadar dibîne;
Xala yekemîn ev e ku saziyên mafên mirovan dikevin bin bandora siyasetê. Saziya Kurdpa, wek bingeha xwe ya sereke, hewl dide ji bo eşkerekirin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan, ji siyasetê dûr be. Di vî warî de Kurdpa dixwaze serxwebûn û pêşketîbûna xwe biparêze û dûrî ramanên siyasî be.


Ev sazî, ramana xwe û enerjiya xwe, ji bo parastina mafên mirovan bi kar tîne ku di vê rêbazê de dehan qurbanî jî dane. Ne tenê rêveber û avakerê wê hate şehîdkirin, lê belê bi dehan rojnamevanên Kurdpayê jî çendîn caran ji aliyê dagirkar ve rastî givaşan hatin. Lê ji bo Kurdpayê, parêzvanîkirin ji mafên mirovan ji her tiştî girîngtir e. Lewma jî qet bixwe piropagende bi wan nekiriye.
Ji bilî van du xalan, saziya Kurdpa amaje dide xaleke din a herî girîng ku derbarê piştrastkirina zanyariyan e. Eger saziyek, hemû gotegotan wek nûçe belav bike, ne ew sazî dikare bibe cihê baweriyê û ne jî karê rêveberên wê, wek dilsozî tê binavkirinn. Kurdpa di beşa dawiyê ya daxuyaniya xwe de dibêje: “Xala sêyemîn jî ev e ku saziya Kurdpa, zanyariyên xwe ji xeynî çavkaniya sereke, ji çavkaniyeke duyem jî piştrast dike. Em zêdetir di vê derbarê de girîngiyê didin nûçegihan, parêzer û wan çalakvanan ku ji berê ve di vê mijarê de çalak in. Ev pirose, ji bo me baweriyê li pey xwe ve tîne.”

Kurdpa û xebatkarên wê dibêjin heya roja ku binpêkariya mafên mirovan li Kurdistanê berdewam bike, ewê jî di karên xwe de berdewam bin. Herqasî jî ku qet piştevaneke madî ya wan tine be û ji aliyê endamên wê ve xwebexşane bê rêvebirin, lê dîsa jî xebata wan li dijî rejîmê pir girîng e ji ber ku beşeke zêde ji wan binpêkariyan eşkere dikin.

# Efrîn di navbera dagîrkerî û Erdhejê de



N: Ebdûlazîz Qasim



Herêma Efrînê (Kurdax), berî 5 salan ji bivîlerza Mereşê ya di 6'ê Reşemeha îsal de, di 20.01.2018 heta 24.03.2018an de, tûşî operasyoneke leşkerî ya esmanî û bejayî ya berfireh ji aliyê artêşa Tirkiyê û grûpên girêdayî wê hatbû, û piştî bidawîhatina operasyonên leşkerî, ji aliyê Neteweyên Yekbûyî 150.000 penaberên kurd li kampên Tel Rifatê hatin tomar kirin, û li gorî Rewangeha Mafên Mirovan hejmara giştî ya koçberên kurd di gulana heman salê de gihişt 300,000 kesî, û projeyê guhertina demografî û erebkirina Herêma Kurdaxê ji 5 salan ve destpê kiriye, ku niha zêdetir ji 400 hezar kurd ji ser mal û milkên xwe hatine koçberkirin û li şûna wan çekdarên opozisyonê yên alîgirên Tirkiyê û malbatên wan ji Şamê, Dêrazorê, Hums û Hemayê hatine hawirde kirin, ku rêjaya Kurdan li Herêma zêdetirî ji 95% bû niha bi tinê 25% kurd dimînin.

Îro tevî ku baweriya miketê Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi partiyên siyasî sist û lawaz bûye, lê hevdem ku ticarî baweriya vî miletî bi doza neteweyî lawaz nebûye, berovajî ku îro bawerî bi doza neteweyî zêdetir bûye û herwisa ku hestê neteweyî û mirovî yê miletê kurd li her pênc parçeyên Kurdistanê li hember alîkarî û hawarçûna

Guhertina demografî û tawanên çeteyên dagîrkeriya Tirkiyê yên dijemirov heta di roja erdhejê de jî nehatin rawestandin, û nijadperistiya van çeteyan di rojên pêşiyê yên erdhejê de û heta îro bi zelalî diyar dibin û hewlên berdewam didin ji bo bikaranîna erdhejê ji bo armancên xwe yên dijekurd.

Di van rojên erdhejê de ji aliyê rêxistinên çavdêriya mafên mirovan bi sedan binpêkirinên li ser miletê kurd hatine tomar kirin û heta rê li pêşiya karê dezgehên Xêrxwazî li Efrînê bi taybetî li Cindêrisê têne girtin û zêdebarî karên dizî û talankirinê yên van çeteyan li ser malên qurbaniyên erdhejê ...

Erdheja Mereşê ya di 6'ê Reşemehê de, ya ku piraniya qurbaniyên wê kurd in, çi li Bakurê Kurdistanê yan li Rojavayê Kurdistanê (Cindêris) bi taybetî ne ji aliyê çeteyên opozîsyona Sûrî ya girêdayî Tirkiyê ve tê bikaranîn, lê herwisa ji aliyê Tirkiyê û Sûriyê ve jî tê bikaranîn, ku herdem dewletên dagîrker qazinc ji karesatên gelê me dîtiye, ku îro jî ev karesat ji aliyê her yek ji dewleta Tirkiyê û Sûriyê wekî derfeteke zêrîn tê bikaranîn ji bo bidestxistina destkeftên siyasî û aborî û herwisa ji bo xweşkirina têkiliyên xwe yên cuda cuda digel welatên cîhanê li ser hesabê malwêraniya gelê Kurd!

Tevî wisa jî, li aliyek din ku pirsa Herêma Efrînê careke din bû mijareke giring û dîsa ket rojevê, vê carê bi rêya erdhejê, û bi dîtina min ku heger partiyên siyasî, rêxistên civaka sivîl yên kurdan bi cidî li ser asta navdewletî bixebitin û kar bikin ji bo pirsa xwe ya neteweyî, dikarin digel van şert û mercên niha yên piştî erdheja li Cindêrisê, doseya Efrînê nû bikin û careke din danin li ser mesaya Neteweyên Yekgirtî û saziyên wê yên navdewletî û erdhejê biguherînin ber bi erdhejeke kurdî li dijî dagîrkeriyê û rizgarkirina herêma Efrînê heta Serêkaniyê.

# Îsraîlê binkeyên Spaha Quds li Suriyê kirine armanca mûşekan

Binkeyên Spaha Quds li taxa "Kefersûse" ya bajarê Demişqê kevte ber êrîşa esmaniya Îsraîlê û bi 10an kes ji hêzên rejîma Îranê hatine kuştin û birîndarkirin.



Şeva Yekşemî 30ê Rêbendanê, demjimêr 1ê sibêdehê, binkeyên Spaha Quds li taxa "Kefersûse"ya bajarê Demişqê li Sûriyê kevte ber êrîşa mûşekên balafirên şer ên Îsraîlê û ji nav çûne û di vê êrîşê de 15 kes hatine kuştin û 5 kes jî birîndar bûne, rejîma Sûriyê amara kuştiyan 5 kes û rejîma Îranê amara kuştiyan bi 13 kes belav kirine.

Herwisa Çavdêrê Mafê Mirovî yê Sûriyê bi belavkirina raporekê daye zanîn ku, binkeyeke çandî ya rejîma Îranê li taxekê di navbera taxa "Zêynebiye" û "El_diyabê" li derdora bajarê Demişqê bi tevahî ji nav çûye û çend navendên ewlehiya rejîma Sûriyê jî di vê êrîşê de bûne armanca mûşekên balafirên Îsraîlê û 15 kes ji milîsên girêdayê rejîma Îranê di vê êrîşê de hatine kuştin.

# Helbet Dê Zivistana Biqede.Bihara

**N: Kofîxwar**

Helbet ev rojên reş jî wê bihuribin. Biharê dîsa bê, giyanê me yê dîsa bisincir e, dilê me yê dîsa şa bibe. Em ê dîsa di şahiyên mezin de hêviyên pêşerojan xurt bikin. Em ê dîsa destên xwe bidin nav mila hev dilanên mezin geş bikin, dîsa gavên me yê bibeqin, bi ezmîn bikevin. Em ê dîsa bi arîkarîya gelê xwe rabin bi ser xwe. Çimkî em Kurd in; xurt in, jîr in, jîrek in. Ne tenê îro ev hezar sal in kurdan çendîn tofan dîtine, çendîn komkujî di serê wan de derbas bûne.Tu carî heviya xwe, baweriya xwe winda nekirine. Kurdino dilê xwe reş mekin, xweliyê serê xwe nekin. Dilê xwe fireh bikin em ê dîsa bikenin. Bi zarokên xwe şa bibin.

Roja îro ev demeke sê parçeyên Kurdistanê, êş, xemgînî, cangorî, zordarî kêm nabe. Ev nêzikî nîv sal e li Rojhilata Kurdistanê bi kuştina Jîna Eminî ve Kurd careke din rabûne bi ser xwe. Li hemberî rejîma mellayan serhildanan pêk tînin. Rejîm her roj, bi her keliyekê Kurdan an dikûjin an seqet dihêlin an jî dikine zîndanan. Lê dîsa jî Kurd serê xwe natewînin, dîsa gavekê bi şûn de navêjin. Heta roja azadiyê dê wisa bi serbilindî, serfirazî têbikoşin. Di sirûda netewî de çi dibêje"Kes nebê Kurd dimire, kes nebê Kurd dimire, Kurd jîn dibe! Jîn dibe qet nakeve ala Kurdan..."
Ji pey ewqas cangoriyên Rojhilatê, Rojavayê ev nêzî 15 roj in îcar jî erdhej pêşiyê bajarê Xoyê, piştre Bakur û Rojavayê Kurdistanê serûbin kir. Nêzî 50î hezar însanên me mixabin canê xwe ji dest dan.
Mixabin 200 hezarî zêdetir însan ji cih û warên xwe bûn, malên wan hatin xwarê. Herweha nêzî 50î hezar kes birîndar bûn. Bakurê 10 bajarên (Amed/Diyarbekir, Meletî, Mereş(Mahrareş), Semsûr, Dîlok, Xetey, Riha, Edene, Kîlîs, li Rojavayê Efrîn, Cindirêsê di du erdhejên( mezinahî 7. 7/ 7.6) li pey hev de gelek zirar ditîn.

Beriya herkesî tev hêzên dewletê di wan rojên reş û bêbext de Kurdan xwîşk û birayên xwe tenê nehiştin. Nehiştin pişta wan bişkê, nehiştin xwîşk, birayên wan bêkes bimînin. Arîkariyeka bihevbeşî yeka pir û pir mezin pêk anîn hêj tînîn jî.Xîretxwazekê li ser medya civakî gotibû"em hêj nemirine helbet em dê piştgiriyê bikin bi hev re rabin li ser piyan."Ev bêj, gotin dilê me fireh dike, agirê kezeba me piçekî ditemirîne.

Di wan rojan de du xalên girîng ketine rojeva Kurdan, balê dikşînin bi ser xwe. Dixwazim bi kurtî yeko yek li ser wan bisekinim.

Ya yekem li Rojhilatê ve girêdayiye. Me ji berê jî çendîn caran qal kiribû; Li Rojhilatê ku Farsiyan dagirkiri ye ev çend meh in Kurd her roj di şeqaman de ne, nerazitiya xwe nîşan didin. Herweha Belûc jî. Rejîma xwînxwar wan dikûje, desteser dike, çavên wan derdixe, kêlên wan (mezel) xirab dike, zar û zêçan, jin û mêran bi hovane direvînin, bi tahdeyan dikujin. Lê, rejîm dûrî Farsiyan disekine, ewqas zirarê nade wan. Ez ê ji bo wê nimûnekê nîşan bidim; Di şeqaman de neraziyên Farsîyan bi gazê ve belav dike, kêm zirarê didine wan, lê heke cihê Kurdan û Belûciyan be heta bigihîje bi mûşekan ve raserî nerazitiyan dibin, rasterast gulebaran dikin. Ji ber wê kuştî, seqet, girtî pirranî Kurd in, piştre Belûc in. Lê li derveyî Îranê ango li seranserê Dinê xwe diçirînin her kuştiyan xweyî derdikevin, li ser cangoriyên Kurdan polîtîkayên xwe dimeşînin. Kuştiyên Kurdan û Belûciyan wek Îranî nîşan didin.

Ji bin ve sîyaseta xwe, serweriya xwe, hişmendiya dagirkeriyê, ji tinekirina neteweyan, dirûtiya xwe vedişêrin. Li her bajarên bîyanî xwepêşandanan pêk tînin, ala xwe ya berê dihejînin, bi dirûşmeyan dewleta xwe ango serweriya farsiyan xweyî derdikevin. Gava ku tu ala xwe ve tevî çalakiyan bîbî yekcar li dijî te derdikevin, dibêjin em giş Îranî ne(hûn wek Farsî bixwînin) ne hewce ye aleka din derxînin. Em ê giş di bin vê alê de bi aramî bijîn. Dem dema ji hev qetandinê nîn e. Divê em piştgiriyê bidin hev, raserî mellayan bikevin, li wan têk bibin. Gotina wan a aşkere ev e; bila Kurd wek beriya di sala 1979 an bi kuştinan rejîmê biguhere em jî bi hêsanî dîsa li gorî dilê xwe bibin serwer. Tu carî jî rê nedine Kurdan bi ser de wekî her carê pêşiyê dadiliqînin û her mafên wan bin pê bikin, keda wan bixwin. Dîsa welatê Kurdan bibe mêtingehê me. Hişmendî di heman de. Ev çend roj in li derve bi çend kesên popûler digel çend kesên siyasî ve dicivin. Ji bo pêşeroja Îranê daxûyaniyan belav dikin. Xwedêgiravî dê li nav sînorên Îranê dê bi aramî (hûn wek bi zorê û darê bixwînin) wekhev bijîn. Divê Îranî bona wê hewl bidin. Em li nav Îranê de tenê neteweyek in, ew jî Îranîbûn e.
Dema cûdabûnê nîn e. Ka em serbikevin, rejîmê têk bibin piştre .... û felan û bêvan. Dê tim ji me re çîrokên bi vî awayî bibêjin. Lê, Kurd anegorî xwesteka wan tevnagerin. Îro li derve, di dewletên bi hêz de bona dîplomasiyeka xurt hewl didin. Ne dema berê ye ku dîsa me ji bo berjewendiyên xwe derxine pêş piştre riman li pişta me bixin. Wisa dizanin ewan tenê çavvekirîne. Baweriya Kurdan êdî xeynî xwe tu kesan nîn e. Rojhilat azadiyê, li ser welatê xwe serxwebûnê heq dike, dixwaze jî! Kurd ne Pehleviyan, ne demokratîzekirina Îranê herweha di parçeyên din de dagirkeran dixwazin. Çimkî ewan her demê Kurd tune kirine.

Mafên wan ê însanî bin pê kirine. Kurd kuştine, nefî kirine. Lewma Kurd serxwebûnê, azadiyê dixwazin. Em naxwazin her dem xemên kuştinê, tunekirinê, nefî kirinê bikşînin. Mesîh û hevalên xwe ye din, binemaliyên Şah Pehlevî tu carî baweriya Kurdan nîn in. Kurd pê de pê de ber bi dewletbûnê ne. Bila herkes, hemû dinya vê ya baş bizanibe.

**Xala duyem**

Ji pey erdheja Mereşê(Gurgum) li Rojavayê jî mal wêran bûn, bi hezaran Kurd di bin kavilan de man. Bi hezaran însan birîndar bûn, bê mal, bê nan û av man. Gelek malbat bi tevî di bin kavilan de man, hinek tûnebûn. Yekem car arîkarî gundiyên wan, xizmên wan, Kurdên deverên din bûn.

Piştre Li Başûrê ku Başûr roya îroyîn nîvdewlet e, xwedî hikûmet e. Ber bi dewletbûnê ye. Hezkî bipêjirînin hezkî li gor dilê we nîn be Başûr xwedî hêz e. Bi ser navê BFCyê ku saziya arîkariyê ya Barzanî ye arîkarî dan Efrînê, Cindirêsê. Li her dilê Kurdan bi vê geş bû. Hêza dewletê çi ye dîtin. Careke din fahmkirin ku heke Kurd xwedî dewlet bin tu carî pişta wan naşikê.

Lê, dîsa ji ber bêdewletbûnê hêzên dagirkeran, çeteyên diz, birçî, hirç û hov raserî arîkariyan dikevin; nan û avên Kurdan ji destên wan hildidin an nadin an jî bi pereyan difroşine wan.

Heke Kurd li ser axa xwe xwedî dewlet bûyan ti kesê nikaribû bi vî awayî bê însanetiyê bike.Yalikî çeteyên dagirkeran aramiyê nadin erdhejiyan yalikî din jî dewleta Sûriye li her deverê arîkariyê dide erdhejiyan, lê xeynî Kurdan. Careke din me fahmkir kû welatê Kurdan ne parçeyên welat û dewleta dagirkeran e. Kurd wekî her neteweyan li ser axa xwe heqê xwedî dewletbûnê dixwaze. Vê gavê dê pirsgirekan çareser bike. Xeynî vê tu çareserî nîn e.

**Bi heviya rojên azad.**

# Hikimdariya ne ji xelkê, bo xelkê nine



N: Hesen Mukerem

Di destpêkê de bi vê mînaka dîrokî û siyasî bînime ber bas, Robert Mugabe serkomarê berê yê Zînbavê û Nelson Mandela li Afrîqaya Başûr, her du ji wan bo heyama salan li dijî koloniyalîzim û nijadperestiyê xebat kirin, lê dema gihîştin bi desthilatê her yek ji wan bi awayekê reftar kirin, Nelson Mandela tevî îsrara xelkê tenê dewreyek serkomarî kir, lê Robert Mugabe bi givaşên navxweyî û navdewletî piştî 37 salan dev ji desthilatê berda, û niha dîrok bi başî bas ji Mogabe nake lê, Mandela weke mînaka rastî, mirovdostî, însaf, lêborîn û heqîqetê bibîr tîne û dîtingeha demdirêja Mandela bi desthilatê bû sebeb ku dewra serkomariya xwe kurt bike ku çawan dibe welat an neteweyek di cîhanê de xweş nav bibe.


Berpirsên welatên weke Norwêj, Danîmark Viyetnam û Japon û Koreya Başûr hertim di fikira ewlehî, xweşderbasî û pêşkevtina welatên xwe bûne û welatên wan bo şer û aloziyan ti carî nabin sernûçeyên medyayan û herwisa digel nebûna çavkaniyên binerd yên weke neft û gaz û zêr û … hwd, bo aramiya welat, ewlehiya welatiyan û pêşkevtina hertimî ya welat, sernûçeyên medyayan in, ji ber ku birêveberên wan welatan dizanin ku bo vejîn û pêşkevtinê nabe zêde denge deng bikî û destêverdanê di karûbarên welatên din de bikî an serweta dewletê bo girûpên terorîstî an alozkirina herêman mezaxte bikî.

Lê, Rûsiya ku dewlemendtirîn welat e di cîhanê de bo hebûna çavkaniyên gaze yekemîne û pêncemîn e jî bo hebûna neftê, û Îran jî duyemîn welat e bo hebûna gazê û sêyemîn welat e bo hebûna neftê di cîhanê de, lê ji ber destêverdan di karûbarên welatên cîran de û xerc kirina serweta welat bo çê kirin û piştevanîkirin ji girûpên terorîstî û afirandina aloziyan di Rojhilata Navîn û cîhanê de û herwisa heçî şer û aloziyek ku di cîhanê de hebe jî, hertim ev bi hegera tedaxula xwe dibin sernûçeyên medyayan.

Bo mînak di heyama hefteyên borî de Navgana Pêncemîn a Hêzên Deryayî yên Amerîkayê bi hevkariya hêzên Taybet ên Fransayê li deryaya Umanê dest danîn ser gemiyeke hilgirê bi hezaran çek û nîv milyon cebilxaneyên Komara Îslamiya Îranê ku ji bo milîsên Hûsî hatibûn şandin û Hêzên ewlehiyê yên Yemenê jî dest danîne ser barê gemiyekê ku 100 motorên balafirên bê pîlot bûn ku her hemû li Îranê hatibûn şandin.
Ji ber piştevaniya wan welatan ji girûpên terorîstî û alozkirina ewlehiya Herêmê, kirîna çek û teqemeniyên Rojhilata Navîn di heyama 5 salên derbasbûyî de, di cîhanê de ji sedî 87 zêde kiriye.

Welatê ku bi qazanca welatiyên xwe tevnegere wiha ye, Komara Îslamî di heyama çil û çend sal temenê xwe de bi berdewamî xelkê xwe ji hemû mafî û hemû xizmetguzariyan bê par kiriye û bi tundtirîn şêweyî ev serkutkirine, li hember de vê rejîmê li ser navê hinartina şoreşa Îslamî bo welatên din "Sidûr inqilab" ev 44 sal e bi armanca berfirehtir kirina îdolojiya xwe, destêverdanê li welatan de dike, li piraniya welatên herêma Rojhilata Navîn de girûpên girêdayî bi xwe çêkirine ku bi çek û cebirxane û diravê xelkê Îranê tên teyar kirin.

Li welatê Sûriyê de bi derfet zanîna şer û aloziyên wî welatî de, rejîma Îranê



çendîn girûpên weke Fatimiyûn û Zeynebiyûn çêkirin, bo armancên taybet yên xwe, bi hemû îmkanateke serbazî û ewlehî û malî piştewaniya rejîma Beşar Esed kir daku sernixûn nebe, bihezaran kes ji hêza xwe ya taya Quds a Sipaha Pasdaran a terorîst xistin nava Sûriyê û heya niha jî berdewam e.

Destêverdana rejîma Îranê li Sûriyê de heya niha ji bilî têçûya dehan milyard Dolaran li warê madî ve bo Îranê, bi hezaran kes ji hêzên rejîma Îranê û girûpên girêdayî bi wê hatine kuştin.
Rejîma Îranê piştî êrîşa Amerîka û hevpeymanên xwe bo ser Îraqê di sala 2003`an de, û sernixûniya rejîma Bees, bi hemû awayekê û berdewam destêverdan di Îraqê de kiriye, çendîn girûpên milîşiyayî çêkirin, hemû armancên xwe yên heyama şerê 8 sale ku xevn pêve didîtin anîn cî, bi curekê rejîma Îranê karî hejmoniya xwe bi ser hemû aliyên siyasî yên Şî`e de bisepîne, û ne rastevxwe di Îraqê de şerê Amerîka bike heta neçar dibe ku meydanê bi tevahî jêra betal bike ku hezaran serbazên Amerîkayê bi awayên nerasterast ji aliyê rejîma Îranê ve hatin kuştin. Şerê DAÎŞê baştirîn hincet bû bo rejîma Îranê ku êrîş bike ser navçên Sunneyan û bi tevahî kavil bike û aliyê kêm bo 50 salî pare bihêle.

Bi navê piştewanî ji bereya Muqawimetê bi dijî Israîl, ev 44 sal e piraniya serweta xelkê Îranê bi girûpên Hemas û Hizbullah û Cîhada Îslamî û xelkê Felestînê û Lubnanê tê bexşîn.

Li Yemenê de bi armanca dijayetî kirina digel Erebistanê, rejîma Îranê piştewaniya madî û serbazî ji Husiyan dike û hemî çek û cebirxana şer bo wan dabîn dike.

Rejîma Îranê li her cihekî cîhanê de derfet û rê dîtibe, destêverdan kiriye, bingeh û xîmî vê rejîmê li ser şer û teror û kuştin û teqandin û xirabkariyê hatiye danîn. Hemî ev kar û kiryarên vê rejîmê jî di heyama wan 44 salan de tenê rojreşî, malwêranî, birsitî, bêkarî, bihatî, û dehan diyarok û bela bo xelkê Îranê re bûye.

Di demekê de ku deshilatdarên vê rejîmê bi wî awayî serwet û samana welat li rêya teror û alozî çêkirin e, berfirehtir kirina îdolojiya rejîma xwe de xerc dikin, bê guman ev desthilata han ji xelkê nine û bo xelkê nine û belkî bi berewajî mezintirîn dujminê xelkê Îranê ye, lewma ye ku em dibînin xelkê Îranê yek deng û yekgirtî dest dane destê hev, ji bona sernixûniya vê rejîma dijî gelî ku bikarin li paşerojê de, desthilateke xelkî û demokratîk bînin ser kar, ku tenê li xema berjewendî û xweşî û pêşkevtina xelkê welat de be, bêguman ev roj nêzîk e ku xelkê Îranê ji dest wê rejîma dîktator xelas bibin û ev jî weke xelkê welatên pêşkevtî bigihîjine asayîş û xweşî û jiyanekî kêrhatiya xwe.

Di dawiyê de, eger hizra dagîrker desthilat û parastina Yemen û Şamê ye, dilê min cem xerîbekê ye ku navê vê nîştiman e, ev genimê ku dagîrker li tûrkê min dibexşe, ev para wî nanî ye ku li ser sifika yên wekî min e, destê bexişîna dagîrker para min nin, lê heta ku digihîje min mixabin lêxistin e.

Her cihê ku mafê mirovekî bê binpêkirin dagîrker xembar dibe, lê dema ku ez basa maf dikim, dibe gurmên li min dix e

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Sine: Wênegirekî Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin

Roja Sêşemî 25`ê Rêbendanê, “Mehdî Tevekolî” wênegirê xelkê Sinê ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin û bo cihekî nexuya veguhastin.

Binçavkirina “Tevekolî” bi bê nîşandana belgeya yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye encam dan.

Herwisa li Banemera sala 1399`an, ew wênegirê Kurd ji aliyê Sitada Xeberî ya îdareya îtla`ata Sinê hatibû gazîkirin û li derheq çalakiyên wî de lêkolîn jê kiribûn.

“Mehdî Tevekolî” roja 21`ê Rezbera 1395`an ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûn binçavkirin û piştî 35 rojan lêkolînkirinê li girtîgeha îdareya îtla`ata Sinê bo girtîgeha Navendî ya wî bajarî hatibû veguhastin.

Navbirî piştî heyamekê bi danîna barimteyê bi awayê demkî hatibû azadkirin û li Pûşpera sala 1396`an ji aliyê taya Yek ya dadgeha Şoreşa Sinê bi tohmeta “çalakî li dijî ewlehiya neteweyî” bi du sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezakirin, û navbirî piştî derbaskirina heyama cezayê xwe dubare li Xezelwera sala 1398`an ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî derbasbûna mehekê bi danîna barimteyê hatibû azadkirin.

“Mehdî Tevekolî” mamosteyê wênegirî yê Encûmena Sînemaya Cewan a Kurdistanê ye û di heyama salên derbasbûyî de çendîn pêşangehên wêneyan bi mijara “penaberên Şengal û Kobanî li Herêma Kurdistanê” li bajarê Sinê birê ve birine.

## Li Dilhoranê du welatî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin binçavkirin

Roja Sêşemî 25`ê Rêbendanê, du welatiyên bi navên “Ferşad Aynî” temen 29 salî û “Se`idula Aynî” temen 24 salî û xelkê bajarê Dilhorana ser bi parêzgeha Îlamê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin binçavkirin û bo cihek nexuya veguhastin.

Ew her du welatiyên Kurd bi bê nîşandana belgeyên yasayî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û li derherq qedera wan ti zanyariyek serast ber dest nine.

“Ferşad Aynî”, ajotvanê Ambolansa nexweşxaneya Dilhoranê ye.

Heta belavbûna vê nûçeyê, li derheq sebeba binçavkirin û tohmetên ku li dijî wan her du welatiyan hatine sepandin ti zanyareke serast ber dest nine.

## Veguhastina Osman Îsmaîlî çalakvanê kedkarî bo girtîgeha îdareya îtla`ata Sinê

“Osman Îsmaîlî” çalakvanê kedkarî ji bo lêkolînê li girtîgeha îtla`ata Seqizê bo girtîgeha îdareya îtla`ata Sinê veguhastin.

Roja Çarşemî 26`ê Rêbendanê, malbata wî çalakvanê kedkarî, bona li pey kevtina rewşa wî, serdana taya 3`ê ya Lêpirsînê ya dozgeriya giştî û Şoreşa bajarê Seqizê kiribûn, û wê navenda dozgeriyê, tevî pejrandina binçavkirina wî çalakvanê kedkarî, ji malbata wî re ragihandine ku “Osman Îsmaîlî” bo berdewamiya lêkolînan li îdareya îtla`ata Seqizê bo girtîgeha îdareya îtla`ata Sinê hatiye veguhastin.

Roja Çarşemî 19`ê Rêbendanê, “Osman Îsmaîlî” bi bê nîşandana belgeyên yasayî li şeqama “Şoheda”ya Seqizê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

## Merîwan: Emced Sa`idî çalakvanê medenî bi danîna barimteyê azad bû

Roja Çarşemî 26`ê Rêbendanê, “Emced Sa`idî” çalakvanê medenî yê xelkê bajarê Merîwanê bi danîna barimteyê li girtîgeha wî bajarî azad bû.

Wî çalakvanê medenî nexweşiya riviyan heye û di heyama binçavkirinê de ji mafê destpêragihîştin bi tedawiyên dermanî, parêzer û hevdîtin bi malbatê re bê par bûye.

Roja Şemî 17`ê Befranbarê, “Sa`idî” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêkolînê bo girtîgeha îdareya îtla`ata Merîwanê hatibû veguhastin.

Herwisa roja Duşemî 28`ê Xermananê jî, ew çalakvanê han yê medenî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî çend rojan bi danîna barimteyê hatibû azadkirin.
Heta niha li derheq tohmetên ku li dijî “Emced Sai`dî” hatine sepandin ti zanyariyeke serast ber dest nine.

# Agirî


◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiśtanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (440)


## Wêneyên erdhej berketiyên Bakur û Rojava









